# Kaxeza agahiyê

**Sernavê Lêkolînê:** Nirxandina Xizmeta Wergerandina Belaş ji bo Pisporên Tenduristiyê yên Hevalbend

**Lêkolînerê sereke:** Jill Waddell, Seroka Xizmetên Nirxandin û Şêwirmendiyê, Hevkarên Tenduristiyê yên Avusturalya

**Rêvebirê projeyê:** Esther White, Şêwirmenda Bilind, Hevkarên Tenduristiyê yên Avusturalya

**Têkilî:** FIS.evaluation@ahaconsulting.com.au an jî 61 3 8632 9503

## Pêşekî

Hikûmeta Awistralyayê xizmeteke nû diceribîne, ew rê dide kesên ku zêde bi Îngilîzî nizanin ku wergêrên belaş bistînin dema ku xizmetên tenduristiyê yên taybet ên wekî psîkolog, pijîşka çavê û fîzyoterapîstan bikar tînin. Hikûmetê ji Hevkarên Tenduristiyê yên Avusturalya (AHA) xwestiye ku bizanibe ka wergêrên belaş alîkariya mirovan dikin ku bi hêsantirî lênihêrîna tenduristiyê bistînin an na.

Ji ber ku te xizmeta wergêrê ya nû bi kar aniye û temenê te ji 18 salî mezintir e, em dixwazin tu anketekê tijî bikî.

Hûn dikarin hilbijêrin ka hûn dixwazin beşdar bibin an na. dagirtina anketê ne mecbûrî ye. Heta eger tu biryar bidî jî, tu dikarî her dem fikra xwe biguherî û xwe ji anketê vekişînî.

## Divê ez çi bikim?

Ji we tê xwestin ku hûn anketek kurt tijî bikin ku dê ji van pirsan bipirse:

- Tu çiqas ji xizmeta wergêr razî bûyî?
- Gelo hebûna wergêrek ji we re bû alîkar ku hûn tenduristî û dermankirina xwe çêtir fam bikin?
- Tu çiqas ji kalîteya wergerê razî bûyî?
- Ger xizmet tunebûya, te dê çi bikiriba?
- Xizmeta çawa dikarbû çêtir ba?

Ji bo ku dagirtina anketê hêsan be, hûn dikarin bersivên xwe li lîsteyekê hilbijêrin. Her weha hûn dikarin li gorî dilê xwe bersiv bidin; ne hewce ye ku hûn yek ji bersivan ji lîsteye hilbijêrin û heke hûn bixwazin hûn dikarin pirsan derbas bikin.

Anket dê nêzîkî 15 deqîqeyan bidome. Hûn dikarin hilbijêrin ka hûn çawa dixwazin anketê bikin:

- **Serhêl:** Hûn dikarin anketê li ser komputer an têlefona xwe bikin Free interpreting service evaluation. Anketa serhêl bi Îngilîzî û zimanên din e ên ku bi giştî têne bikar anîn. Eger zimanê te ne berdest be, tu dikarî anketê bi rêya telefonê bi wergêrekî belaş bikî.
- **Bi telefonê:** Hûn dikarin anketê bi rêya telefonê bi wergêrekî belaş bikin. Telefon ji bo 61 3 8632 9503 bikin.
- **Bi nivîskî:** Hûn dikarin anketê bi her zimanî bi nivîskî bikin. Heke hûn anketek kaxezî dixwazin, ji kerema xwe e-mailek ji FIS.evaluation@ahaconsulting.com.au re bişînin. Em ê wê bi zarfekî ku bersiva wê hatiye dayîn ji we re bişînin.

Eger ti yek ji vebijarkên jorîn ji we re nexebite, ji kerema xwe re e-mailek ji bo vê navnîşanê bişînin: FIS.evaluation@ahaconsulting.com.au. Em ê hewl bidin ku rêyek din bibînin da ku hûn beşdar bibin.

## Ma ez ê pere werbigirim?

Ji bo spaskirina we ya ji bo dema we, em dê karta dîyarîyê ya 30 dolarî pêşkêş bikin.

Ji bo wergirtina karta diyariyê, hûn hewce ne ku nav û navnîşana e-maila xwe di dawiya anketê de parve bikin. Hûn hîn jî dikarin bêyî parvekirina van hûrguliyan bersiva anketê bidin, lê em ê nekarin karta diyariyê ji we re bişînin.

## Feydeyên wê çi ne?

Hikûmet dixwaze ji bo ku mirov hêsantir bikaribin wergêran bikar bînin dema ku hewcedariya wan bi lênihêrîna tenduristiyê hebe, nêrînên we bikar bîne.

## Xeteriyên muhtemel çi ne?

Ger hûn beşdar bibin, em ti xetereyên mezin pêşbînî nakin.

## Ma divê ez anketê bikim?

Ew biryara we ye ku hûn bixwazin anketê bikin an na. Ew ê bandorê li peywendiya we bi pisporên tenduristiyê yên hevkar an wergêran re neke.

Hûn dikarin her dem rawestin, heta piştî destpêkirinê jî. Heke hûn dixwazin bersivên we werin jêbirin, tenê e-mailek ji FIS.evaluation@ahaconsulting.com.au re bişînin. Lê heke we agahiya têkiliyê parve nekiribe, em ê nikaribin bersivên we nas bikin, ji ber vê yekê em nikarin wan jê bibin.

## Dê çi bi agahiyên ku ez pêşkêş dikim bê?

Her çi ku hûn dibêjin dê taybet bimîne. Ew bi kesên din re nayê parvekirin heya ku hûn destûr nedin an jî ji ber qanûnê neçar bimîne ku were parvekirin.

Eger wergêrek di dema hevpeyvîna we de alîkariyê bike, divê ew li gorî rêziknameyên exlaqî yên fermî tevbigerin. Ev tê vê wateyê ku ew neçar in her tiştê ku hûn dibêjin nepenî bihêlin. Piştî anketê, ew ê nikaribin agahiyên we bi dest bixin.

Em ê anketê li dora 60 kesan bipirsin ku xizmeta wergêriya belaş bikar anîne. Dema ku em raporekê ji bo hikûmetê dinivîsin, em ê piştrast bin ku nasnameya kesî neyê eşkerekirin. Em ê bersivên anketa we 5 salan piştî ku proje diqede biparêzin. Wê demê em ê wan jê bibin.

## Ma ez ê li ser encamên vê lêkolînê bibihîzim?

Em ê rapora xwe di Mijdara 2025 an de bidin Wezareta Tenduristî, Astengdarî û Pîrbûnê. Wezaret dikare raporê biweşîne.

## Kî vê lêkolînê fînanse dike?

Ev lêkolîn ji aliyê Wezareta Tenduristiyê, Astengdarî û Pîrbûnê ya Hikûmeta Awistralyayê ve tê fînansekirin.

## Ez dikarim agahîyên zêdetir ji ku bidest bixim?

Hûn dikarin bi me re pêwendiyê deynin li ser:

61 3 8632 9503

FIS.evaluation@ahaconsulting.com.au

An jî ji kesekî/ê ku hûn pê bawer in bixwazin ku li ser navê we bi me re têkilî dayne.

## Kê ev lêkolîn nirxandiye?

Komîteya Etîka Lêkolînên Mirovan a Bellberry ev lêkolîn li gorî Daxuyaniya Neteweyî ya li ser Reftarên Etîkî di Lêkolînên Mirovan de (2023) nirxand û qebul kir. Ev Daxuyanî ji bo parastina berjewendiyên kesên ku razî dibin beşdarî lêkolînên li ser mirovan bibin hatiye pêşxistin.

Eger hûn bixwazin li ser lêkolînê nîqaş bikin an jî kopiyek ji prosedûra Gilîkirinê bi kesekî/ê ku rasterast ne têkildar e re bibînin, bi taybetî di mijarên têkildarî polîtîka, agahdî an giliyên li ser rêvebirina lêkolînê an mafên we wekî beşdar, hûn dikarin bi Rêvebirê Operasyonan, Bellberry Limited re li ser 08 8361 3222 têkilî daynin.

## Razîbûn

Bi temamkirina anketê, hûn nîşan didin ku hûn agahdiya hatî dayîn fêm dikin, kêfxweş in ku beşdar bibin, û hûn qebûl dikin ku em bersivên anketa xwe di raporê de bikar bînin.